

## Sûriye, di navbera Federalîzmê û Modela Yugoslavya de

Piştî derbasbûna deh mehan li ser desthilata Ehmed El-Şera’h, diyar dibe ku ev desthilat Sûriyê ber bi çarenivîsek nediyar dibe, nemaze ku komkujiyên li dijî Elewî û Durzî bûne hereşeyek rasteqîn li ser yekîtiya Sûriyê û zengilê metirsiya dubarekirina diktatoriyek .....

Dom»R:8



*Bidesîveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siyasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (501)08-09-2025 Buha (1000) Tûmen*



## Çarenivîsa Hemî Dîktatoran Hilweşîn e

Lê piştî êrîşa rasterast a Îsraîl û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê li ser hedefên navokî û jiholêrakirina fermandarên Sipaha Pasdarên, helwesta dîktator Xameneyî şikest, û piştî salan ji hereşe , Xameneyî neçar ma ku di êrîşa 12 rojî ya Îsraîlê ya li ser rejîmê de bireve penageheke bin erdê, û 22 roj piştî bidawîbûna şer, ew di nav alîgirên xwe de bi Fedî û bi rûyekî şikestî xuya bû.

Dom» R:9



## Çalak kirina Mikanîzma Trîger li dijî Îranê: Encam û Derfet

Mikanîzma Trîger, yek ji mercên sereke yên li hev hatinê li dor bernameya navikî ya Îranê tevî welatên rojava ya naskirî bi ” JCPOA” wate “Bercam” di sala 2015’an de bû, ku rê dida welatên endam bi hegera binpêkirina girêbesta lihevhatinê ji aliyê Îranê ve, ceza û dorpêçên ku Konseya Ewlehiyê ya Neteweyên Yekbûyî bi ser rejîma Îranê de sepandibûn, ji nû bên destpêkirin.

Dom» R:5

## Bi hilkefta weşana hejmara 500 a Rojnameya Agirî koryadek bi rê ve ço



Navenda Ragihandina Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta weşana hejmara 500 a Agirî, koryadek bi rê ve bir. Armanca ji vê koryadê ku êwara roja Şemî 15ê Xermananê li yek ji binkeyên Hizba Dêmokrat de bi rê ve ço, hilsengandinek li pêgeha rojnameya “Agirî” û herwisa bilindragirtin û giringîdan bi cehd û tekoşîna xebatkarên vê rojnameyê û berdewambûna wan li heyama 22 salên derbasbûyî de bû.

Koryad bi sirûda netewiya “Ey Reqîb” û bîstek bêdengî bo rêzgirtin ji rihê paqijê şehîdan û belavkirina girtevîdyoyekê li ser pêvajoya avakirin û berdewamiya rojnameya “Agirî”, dest pêkir. Piştre, peyama rêzdar “Mistefa Hicrî”, Sekreterê Giştî yê Hizba Dêmokrat bo vê hilkeftê, ji aliyê rêzdar “Elî Budaxî”, endamê Komîteya Navendî ya Hizba Dêmokrat ve hate pêşkêşkirin û li berdewamiyê de destegulek ji aliyê Desteya Kargêrî ya Hizba Dêmokrat ve ji aliyê rêzdar “Mistefa Mewlûdî”, Cihgirê Sekreterê Giştî yê Hizbê ve bi rêzdar “Nûredîn Sofîzade”, sernivîskarê rojnameya Agirî, hate pêşkêşkirin.

Li pareke din a koryadê de rêzdar “Omer Balekî”, Endamê Desteya Kargêrî û Berpirsê Navenda Ragihandin a Hizba Dêmokrat, gotara Navenda Ragihandin a Hizbê ya bi vê hilkeftê pêşkêş kir. Navbirî li vê gotarê de îşare bi armancên weşan a “Agirî” kir û got ku li rewşa xebat û tekoşîna Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê de wek Hizba Pêşeng a xebata netewî-dêmokratik a gelê Kurd, gihandina siyasetên Hizbê bo nav gelê Kurd li hemû deverên Kurdistanê, erkek hewce û girîng e, bo me jî wek Hizbek netewî gelek hewce bû û niha jî her hewce ye ku li pêxema pêşxistina xebata neteweiya xwe de bixwazin tekoşînê bikin ku hemû çîn û qatên civakê li hemû Kurdistanê li dora bername û siyaetên Hizba xwe, Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, kom bikin. Bo vê armancê jî pêdiviye ku mifah ji hemû devokên cuda yên zimanê Kurdî verbigrin û her bo vê armancê jî bû ku rêberiya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li heyva Sermawez a sala 1382 a Rojî de biryar da ku vê delîvê bo weşana “Agirî” bi devoka Kirmanciya jorîn li ragihandin a Hizba Dêmokrat de çêke û bi vê şêwazê, “Agirî” bi sermayê mêdyayî û xebata Hizba Dêmokrat zêde bû.

Gotara Desteya Birêveberiya “Agirî” ji aliyê rêzdar “Nûredîn Sofîzade” û gotara rêzdar “Mihemedsalih Qadirî”, yekem berpirs û sernivîskarê Rojnameya “Agirî” 2 beşên din ên vê koryadê bûn ku li her 2 gotaran de ji bi dîtingehên taybet ve, rohnkirin li ser giringiya weşan û berdewamî ya rojnameya Agirî û bandor û karlêkeriya bi ser xebat û tekoşîna Hizba Dêmokrat û tevgera siyasiya Kurd li Rojhilatê Kurdistanê hate dan.

Di parekî din ya vê koryadê de, pêşkêşkirina xelat û lewhên rêzgirtinê bi sernivîskarên berê û pêrsonêla niha ya rojnameya Agirî û beşa Kirmancî li Ragihandina Hizbê de bû.

Çapemeniya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li demsala Payîz a sala 1382 a rojî de bi çap û weşandina rojnameya “Agirî” bi tîpên Latîn û devoka Kirmanciya serî, berhemek din bi ser berhemên Ragihandina Hizba Dêmokrat zêde kir û “Agirî” piştî 22 sal berdewambûnê, niha yek ji sermayên xwedî nirx û şan ên ragihandina Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê ye.



## “Jin, jiyan, Azadî” piştî Sê salan, Ji Dirûşmeyê Ber Bi Stratejiya hevbeş

Dom » R:3



## Pencereya fersendan yan amadekirina mezelê rejîmê!?

Dom » R:4

# Peyama Navenda Ragihandina PDKÎ Bi hilkefta weşana hejmara 500 a Rojnameya Agirî

Tevî bixêhatinkirina dubare li we hêjayan bo vê korê, pîrozbahiyê li bêrêveberan û staf a rojnameya “Agirî” ku li heyama 22 salên derbasbûyî de wek sermayeyekî midyayî ya xwedînirx û şan a Ragihandin a Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi belavkirina dîtingeh û şiroveyên Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê û lipeyketinên bo pirs û mijarên pêywendîdar bi Rojhilatê Kurdistanê bi tîpên Latîn û zaraweya Kurmancî ya serî, bi pêka îmkanatan û rewşa Hizbê lê bi îrade û berdewamiya cihê rêzgirtin û pêzanînê, tekoşîn kiriye û karên xwe bi rê ve birine.

**Rêzdaran!**

Ew rastiya nayê înkarkirin ku li rewşa xebat û tekoşîna Hizba Dêmokrat a Kurdiustana Îranê de wek Hizba Pêşeng a xebata netewî-demokratîk a gelê Kurd, gihandina siyasetên Hizbê bo nav gelê Kurd li hemû deverên Kurdistanê, erkek hewce û girîng e. bo me wek Hizbek netewî, gelek hewce bû û niha jî her hewce ye ku li pêxema xebata netewî ya netewa xwe de tekoşînê bikin û bixwazin hemû çîn û qatên civakê li hemû deverên Kurdistanê li dora bername û siyasetên Hizba me, Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê kom bikin.

Bo vê armancê, hewceye ku mifah ji hemû zaraveyên cuda yên zimanê Kurdî bê vergirtin û her bi vê armancê jî bû ku rêberatiya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li heyva Sermawez a sala 1382 a rojî de biryar da vê delîvê bo weşana Agirî bi zaraweya Kurmancî ya serî, bo ragihandina Hizba Dêmokrat vebike û bi vê şêwazê, “Agirî bi sermayeya ragihandin û xebatka Hizba Dêmokrat zêde bû.


Tevî ku ez mafê vê yekê nadim bi xwe ku li derheq “Agirî” û naveroka vê rojnameyê û hilsengandina kar û tekoşîna vê li heyama wan 22 salan û belavbûna 500 hejmar ji vê rojnameyê biaxivim û ez zêdetir vî mafî didme bi wan hevalan ku ji destpêka kar û weşana vê de li rojnameya Agirî de kar kirine û yên ku têde kar dikin, lê li hemen demê de ez bo afirankarî û berdewambûna wan, destxweşiyê li wan dikim.

Lê carê li ser navê “Agirî” dibe bibêjin ku hilêbijartinek gelek civan û watedar bûye, Çimkî navê Agirî, tevî ku navê bilintirîn çiyayê Kurdistanê ye û nîşaneya xweragirî û ronahiyê ye, hevdem bîrhênerê dîroka tejî serwerî û jixwebihorîn û cangorîkirina xebatkarên Kurdistanê û hêma û sembola bihevregirêdana gelê Kurd li 3 beşên Kurdistana perçekirî ye.

Lewma hivî dikim ku rojnameya “Agirî” bi hewldan û îradeya birêveberên vê bi bilindahî û dîroka çiyayê Agirî, li kar û tekoşîna xwe de berdewam û li geşekirinê de be.

Perçekirina ax û netewa Kurd bi ser 4 dewletan de û çêkirina sînorên destçêkirî li heyama 100 salên derbasbûyî de, wiha kiriye ku ziman û kultûra netewa Kurd heta astekê li beşên parçekirî ji hev dûr bikeve.

Bo vê yekê ku ev dûrketin kêm û kêmtir bibe, yek ji şêwazên bingehîn, çal-




akiya ragihandin û midyayî bi zaraweyan e. ragihandin bi deng û reng be, an bi nivîskî be, girîng nîne.

Girîng ev e ku bi zaraveyên xwedî berdeng be, bo vê ku jê têboihîjin û li wir de rastiya vê gotinê tê xuya ku hatiye gotin, Ragihandin pira li navbera gelê Kurd li her 4 aliyên Kurdistanê ye.

Ji niha ve em dikarin bi eşkere bibêjin ku rojnameya Agirî bi hemû beşên xwe ve, vê rolê cîbicî dike û heta astek baş kariye cihê xwe li nav xwendewarên li Bakûrê Kurdistanê bi her beşên xwe ve veke, û zêdetir wan digel siyaset û şiroveyên Hizba Dêmokrat li ser mijar û babetên cuda yên pêywendîdar bi pirsa Kurd û dîroka tejî xebat û qurbanîdana gelê Kurd û Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li Rojhilatê Kurdistanê aşina bike.

Li cihê xwe de ye ku spasî û pêzanîna xwe bo hemû hevrêyên birêveber, nivîskar, wergêr û amadekarên li beşa teknîk û dîzayn a “Agirî” de bidin xuya ku li heyama 22 salên derbasbûyî de bo weşîna 500 hejmarên rojnameya Agirî hewl dane û her berdewam bûne û karîne bi îmkanatên kêm, lê bi morel û îradeya pêşmergetiyê, ev erkî pîroz cî bi cî bikin û rojnameya Agirî bigihînin destê xwendewarê têniyê zanîna nûçe û zanyarî û siyasetên Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê.

**Rêzdaran!**

Her wek min îşare pêkir, axaftin li ser naverok û çawatiya rojnameya “Agirî” bo hevalên xwe yên din bi cih dihêlim û bi tenê vê yekê dibêjim ku cihê keyfxweşiyê ye ku rojnameya “Agirî”, beşek bi nirx û şan ji darayiya meinewî ya Ragihandin a Hizba Dêmokrat e û hêviya serkevtina zêdetir bo wan dixwazim.

# Lijneya weşangerê a Kovara Deng, bi hilkefta derçona 500 mîn hejmara Rojnameya Agirî, peyameke pîrozbahiyê bo desteya amadekar a Rojnama Agirî şandiye




**Deqa peyamê wihaye:**

**JÎ BO DESTEYA WEŞANGERÎYÊ YA ROJNAMEYA AGIRÎ**

Lijneya weşangerîya Rojnameya Agirî, xebatkar, kedkar û xwendeyê wê yên hêja!

Bi kêfxweşî û şabûnê agahî gihîşt me ku, rojnameya Agirî yê ku ji aliyê Navenda Ragihandina Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê ve tê belav kirin û dengê Pêşmergeyên gernas û tekoşerên azadixwazên Rojhılatê Kurdistanê ye, hejmara xwe ya 500 ê bi serketinê diweşîne.

Ev yek, ji bona çapemenî û weşangerîya Gelê Kurd cîhê şanazîyê û hêvîyê ye.

Lewra, ev yek ji bona wan gelên ku, wekî gelê Kurd ji mafê perwedehîya bi zimanê xwe yê netewî bêparin, nîşana berxwedaneka mezin e. Civak bi saziyên xurt û domdar dibine netew û ronahîdîde. Sazîyên weşangerîyê ji bona netewan, warê ronahîyê, wargehên ronakbînîyê nin. Ew, her wiha çira û findên sîyaseta wan, amûrê zelalkirina asogehên wan nin.

Em vê rastîyê ji nêzde dişopînin û pê dizanin ku, Rojnameya Agirî, di vî warî de nimûneyeke here hêja, girîng û balkêş e.

Bi rastî, ew xebatên we yên mezin, dûr û dirêj cîhê pesnê ne. Ev bi dehan sal in ku hûn bi kedeke bêhempa, bi berxwedaneke kûr û fireh, bi hîvîyeke mezin ve, wî karê pîroz bê rawestan dimeşînin.

Em şahid in ku, Rojnameya Agirî, di wan 500 hejmarên xwe de, ronahîyê û rastîyê gîhand binê zindanên dagirkeran, gîhand serê çîyayê Kurdistanê, kuçe û kolanên gund û bajarên wê. Li wan dera hîvîya berxwedanê reşand. We, di encama van xebatên giranbiha de, ji bona Gelê Kurd sazîyeke hêja, arşîveke mezin û giranbiha pêk anîye.

Em wek lêjneya weşanê a Kovara Dengê, hejmara 500 ê a Rojnameya Agirî li hemû xebatkarên wê, nivîskarên wê, xwîner û xwendeyên wê û alîgirên wê bi dil û can pîroz dikin.

Daxwaza me ew e ku, Rojnameya Agirî bi vê ronahiya xwe ya xurt, deng û agirê rastî û azadîyê bi hêztir belav bike.

Bi hestên germê ve, pîrozbahiya xwe pêşkeş dikin.

**Bi Rêz û silavên ve...**

**4ê Îlon a 2025 an**

**Lijneya weşangerê a Kovara Deng**

# “Jin, jiyan, Azadî” piştî Sê salan, Ji Dirûşmeyê Ber Bi Stratejiya hevbeş



N. Dr. Mecîd Heqî

Sê sal ji roja ku navê Jîna Emînî bû ala “Jin, Jiyan, Azadî” derbas bûn, sê sal ku zimanê siyaset û exlaqê giştî ji bo nifşekî guherand. Îro, heke em rast bêjin, em hîn jî di gavên pêşîn ên hevgirtina neteweyî de ne, lê pirsa bingehîn êdî “tundiya xwepêşandanê” nîne, pirs ev e ku gelo sermayeya exlaqî û civakî ya wê serhildanê dikare veguhere stratejiyek pîvanbar, domdar û li hember tepeserkirinê berxwedêr?

Di mehên pêşîn ên şoreşa Jîna yê de, hêzên siyasî yên rojhilatê Kurdistanê bi hevrêziyek berbiçav derketin holê, û di heman demê de, ji bo cara yekem, îradeya gelê Kurdistanê sînor derbas kir û bi îradeya gelên din ên Îranê re wekhev bû, kêliyek kêm a “têgihîştina civakî û siyasî”. Lê ew dom nekir. Nakokiyên ku ji nivîs û peymanên wekî Peymana Georgetownê derketin holê, û her weha nebûna “projeyek neteweyî ya yekgirtî û alternatîfek zelal” ku dikare hêzên Kurdistanê û gelên Îranê li dora kêmtirînên hevpar bike yek, hevgirtina derketî holê xera kir. Makîneya tepeserkirinê bi kuştin, girtinên girseyî û darvekirinan kapasîteya kolanan kêm kir, û di valahiya bernameyek hevpar de, li şûna vekolîna navxweyî û fêrbûna kolektîf, çerxek sûcdarkirina hevbeş dest pê kir, valahîyên ku sermayeya civakî kêm kirin û rêya ber bi hevpeymaniyên watedar dijwar kirin.

Lêbelê, şoreşa Jîna divê wekî şoreşek nasnameyeke nû di têkoşîna rizgariya gelê Kurdistanê de were hesibandin, şoreşek ku jinan ji marjînalan anî çarçoveya siyasî, zimanê wekheviyê bi daxwaza edalet û rûmeta mirovan ve girêda, û nifşê “Z” bi amûrên vegotin û torê anî ser dikê. Ev sermayeya sembolîk û çandî dê hêdî hêdî belav bibe ger bi rêberiya stratejîk ve neyê girêdan. Rêberî (Serokatî) a stratejîk tê wateya veguheztina ji “enerjiya bertek” ber bi “armanc, rê û mîmariya pîvandinê”; ango avakirina saziyên sivik û çevik ku nakokiyan birêve dibin, fêrbûnê çalak dikin û lêçûna beşdarbûnê kêm dikin.

Asoya derve jî guheriye. Ji 7ê Cotmeha 2023an heta şerê 12 rojan di navbera Îran û Îsraîlê de û dûv re aktîvkirina “mekanîzmaya tetikê” di dosyeya nukleriye Iranê de, jîngeha herêmî şiletir û xeternaktir bûye. Ev şilebûn hem derfetek e û hem jî gefek ji bo gelê Kurdistanê ye: derfetek ji ber ku hevpeymaniyên guherbar guhên nû vedikin da ku vegotina li ser bingeha mafan bibihîzin, gefek ji ber ku her hesabkirinek xelet dikare tevgerê bike amûrek pêşbaziya hêzê. Hûnera rêberiya stratejîk di rewşek wisa de “siyaseta senaryoyan” e: xeyalkirin û amadekariya çend rêyên gengaz - ji tundkirina tepeserkirinê bigire heya vekirina bi sînor - bi xetên sor ên zelal di serxwebûna vegotinê û mafên mirovan de.

Xala destpêkê pêşxistina “pûsûleke stratejîk” e: vîzyonek ku rojhilatê Kurdistanek ewle, wekhev û li ser bingeha rûmetê xeyal dike, mîsyonek ku armanc dike ku sermayeya exlaqî ya tevgerê veguherîne projeyek hevpar, û “teoriya guhertinê” ku rê gav bi gav rave dike, ji avakirina wateya hevpar û avakirina hevpeymaniya pir-astî, heya pakêtek polîtîkaya herî kêm, avakirina saziyan a çevik, dîplomasiya yekgirtî û qanûnî, û di dawiyê de berxwedan li hember zext û dabeşbûnê. Vîzyonek bê mîsyon tenê slogan dimîne; mîsyonek bê teoriya guhertinê dibe sedema çalakiyên belavbûyî.

Lê belê “projeya hevbeş” bi rastî çi ye? Bi kurtasî, “bernameyeke herî kêm a pîvanbar” ku dikare di navbera hêzên siyasî yên li Kurdistanê û her weha hevalbendên alîgirê Kurdan de lihevkirina herî mezin bibîne. 1 - mafên mirovan û ewlehî parastina yasayî ji bo girtiyan û malbatan, pêşîgirtina li tundûtûjiyê, protokolên ewlehiya dîjîtal, 2 - wekheviya yasayî-çandî û formên pêşketî yên xwerêvebirinê - misogerkirina ziman, çand û rêveberiya berpirsiyar, 3 - pêşkeftina wekhev - nexşerêyek qonax bi qonax ji bo kar, perwerde, tenduristî û jîngehê bi budçeyek zelal, û 4 - lêgerîna rastiyê û edaleta veguhêz - belgekirina birêkûpêk a binpêkirinan û hevkariya rêxistinkirî bi saziyên mafên mirovan re. Pakêtek wisa dê li şûna înkarkirina cûdahiyan, li ser herî kêm a hevpar bisekine, û dê zimanê “mafan” veguherîne pirek di navbera nasname û siyaseta giştî de.

Ev plan bêyî mîmariyeke saziyê û organizasyon ya cidî li ser kaxezê dimîne. Pêşniyareke pratîkî ew e ku “Konseya Rêveberiya Stratejîk ji bo Rojhilatê Kurdistanê” were avakirin, yek ji nûnerên partî û rêxistinên civaka sivîl û siyasî pêk were, bi kotayên girêdayî ji bo jin û ciwanan, bi qaîdeyên zelal ji bo biryardanê, çareserkirina nakokiyan û herikîna agahiyan. Li kêleka wê, “odeyeke fermandariya hevbeş” hewce ye. yekîneyeke çalak ji bo hevrêzkirina operasyonên medyayê, hiqûqî û parêzvaniyê, rêveberiya qeyranan û bersiva bilez a bûyeran. Ev her du saziyên sivik, ger bi “Komîteya Pîvandin û Fêrbûnê” re - ji bo nirxandina performansê û rêça rast her sê mehan - werin cem hev, dikarin navendîbûna kesane veguherînin navendîbûna qaîdeyan.

Serkirdayetiya stratejîk her wiha “nexşeya xwedî berjewendî” hewce dike. Nav-kurdî, ji partiyan bigire heya komeleyên jin û ciwanan, sendîkayan, torên çandî û jîngehê, divê hemî cihê xwe di mîmariya hevpeymaniyê de bibînin. Trans-kurdî, girêdana bi tevgerên alîgirê demokrasiyê yên etnîsîteyên din ên li Îranê - Belûç, Ereb, Tirkmen, Azerî, Gîlekî û yên din - li ser bingeha mafên wekhev û rûmeta mirovan pir girîng e. Divê dîyaspora jî ji çavdêrek bêdeng ber bi “pêşengek rêxistinkirî” ve were bilind kirin: fonên zelal, berdevkên pirzimanî, torên pisporan di warên aborî, perwerde, tenduristî û hiqûqê de, û dîplomasiya parlemanî û sivîl a hedefgirtî.

Di asta kiryarî û operasyonel de, “pîvanbarî” nayê paşguhkirin. Nimûneyek ji danîna armancek salekê, avakirina encûmenek rêvebirinê û odeyek civînê bi rêziknameyek rêveberiyê û civînên sê mehane yên giştî; çêkirina pakêtên peyamên pirzimanî, notên polîtîkayên hevbeş, û civînek medyayî/akademîk; avakirina databeseke mafên mirovan a belgekirî bi karanîna parêzerên xwedî ezmûn. Ev ne slogan in, ew amûrên fêrbûna rêxistinî ne ku rê li ber veguhertina projeyê bo giştîkirinan digirin.

Divê aliyê exlaqî yê serokatiyê di çarçoveyê de bimîne, ne li ser marjînalan. Parastina rûmeta mirovan, rêzgirtina hevbeş, û qebûlkirina cudahîyan - û veguherandina vê pirrengiyê bo hêzek ajotinê ji bo sinerjî û yekîtîyê di pirrengiyê de - divê prensîbên rêber bin. Parastina çalakvan û malbatên wan, kêmkirina lêçûna tevlêbûna sivîl, şefafiyeta darayî, û hesabdayîn jî divê bibe norm; Bêyî vê, baweriya giştî dê hilweşe û koalîsyonek domdar dê neyê avakirin. Divê edaleta veguhêz jî ji îro pê ve bi ciddî were girtin: belgekirina rast a binpêkirinan, dîtina rastiyan a serbixwe, û sêwirandina mekanîzmayên hesabdayîn ên bi bandor ji bo pêşeroja guhertinê, da ku çerxa tundûtûjiyê neyê dubarekirin.

Di dawiyê de, hemû yên li jor bi têkiliya tevgera Kurd bi neteweyên din û hêzên Îranî ve girêdayî ne. Ger serokatiya stratejîk bixwaze îradeya neteweyî ya Kurd veguherîne “hêzek dîrokî”, divê ew asoyek li ser bingeha maf û rûmetê pêşniyar bike ku ji bo yên din têgihîştî û parastî be, ji mafê diyarkirina çarenûsê bi awayên cûrbecûr - ji serxwebûn û federalîzma pirneteweyî bigire heya rêziknameyên pêşkeftî ji bo xwerêveberiyê bi garantiyên zimanî-çandî yên zelal. Rêzikek wisa domdar û gengaz e dema ku hevsengiya hêzê di berjewendiya neteweyên bindest de diguhere û bi rêya diyaloga sebir û peymanên exlaqî-siyasî tê avakirin.

Niha em dikarin vegerin pirsa orîjînal: Gelo rêberên Kurd dikarin pencereya derfeta îro bigirin û bibin faktora diyarker di têkiliyên li rojhilatê Kurdistanê de? Bersiva kurt ev e: “Erê, heke...” Ger vîzyon û mîsyonek yekgirtî were formulekirin û bi eşkere were ragihandin; Ger encumena rêvebir û desteya rêvebiran bi qaîdeyên zelal û beşdariya rastîn a jin û ciwanan were damezrandin; ger pakêtek polîtîkaya pîvandî ya herî kêm navenda hevpeymanan be; ger dîplomasiya giştî û hiqûqî ya profesyonel, pirzimanî û li ser bingeha daneyan were şopandin; ger nivîsandina senaryoyan û xetên sor tevgera derveyî rêkûpêk bikin; eger exlaqê çalakiyê, şefafî û hesabpirsîn bibin adetên rojane; û eger pîvandin şûna dirûşmeyan bigire.

Sê sal piştî “Jin, Jiyan, Azadî”, em hîn jî di gavên pêşîn ên hevgirtina neteweyî de ne, lê ev gava yekem dikare bibe “gaveke mîmarî”; gavek ku êşa hevpar bi pêşerojek hevpar ve girêdide û îradeya neteweya Kurd careke din , vê carê bi awayekî sazûmanî û hesabdayî, bi îradeya gelên Îranê re li hev dike. Armanc ne kêmkirina daxwazan e, ew zêdekirina kalîteya stratejiyê ye. Ger ev bibe, azadî dê ji xewnekê dûr bikeve û nêzîkî ezmûnek rojane bibe, Ezmûnek ku tê de “Jin, Jiyan, Azadî” ne tenê dê bibe dirûşmeya meydanê, lê di heman demê de pîvana ku her siyaset û her hêzek dê pê were pîvandin jî.

# Pencereya fersendan yan amadekirina mezelê rejîmê!?



N. Elî Munezemî



Di sala 2015an de, Îranê bi pênc endamên daîmî yên Konseya Ewlehiyê ya Neteweyên Yekbûyî - Fransa, Çîn, Rûsya, Amerîka û Brîtanya - û her weha Almanya re peymanek îmze kir.

Ev peyman, ku wekî JCPOA (Bercam) tê zanîn, Îran mecbûr kir ku di berdêla rakirina hejmarek cezayan de ji pêşxistina çekên nukleerî dûr bisekine.

Lêbelê, Îranê qet bi tevahî pabendbûna xwe pêk neanî, û dema ku DYA di sala 2018an de ji peymanê vekişiya, tevahiya pêvajoyê ber bi hilweşînê ve çû. Ji wê demê ve, welatên Ewropî hewl dan ku peymanê zindî bihêlin, lê bê serkeftin.

Niha Almanya, Fransa û Brîtanya hilbijartine ku mekanîzmaya bi navê "snapback" çalak bikin.

Sedem ev e ku Îranê ne bi Ajansa Enerjiya Atomî ya Navneteweyî re hevkariyî kiriye û ne jî zelaliya pêwîst di bernameya xwe ya nukleerî de hebûye.

**"Snapback" tê vê wateyê ku cezayên NY dê otomatîk ji nû ve werin sepandin ger Îran di nav 30 rojan de peymanek nû îmze neke.**

Dîplomatên Ewropî tekez dikin ku ev ne hewce ye ku dawiya danûstandinan be, lê belê rêbaza zextek dijwar e da ku Îran neçar bimîne û vegere ser maseyê.

NY vê demê wekî "pencereya fersendan" bi nav dike, şansek dawîn ji bo dîtina çareserîyê.

Îranê bi tundî bertek nîşan da û înîsiyatîf wekî neqanûnî û siyasî red kir. Rejîm îdia dike ku Ewropayê bi şopandina xeta Amerîkayê û negihîştina alîkariya aborî ya sozdayî peyman binpê kiriye.

Di heman demê de, Tehran hewl dide ku ji bo avakirina mertalek siyasî-desthilatdariyê li dijî Rojava piştgirî ji Çîn û Rûsyayê bi dest bixe, lê bêyî ku ti garantiyek berbiçav werbigire.

**Rejîm her wiha eşkere dibêje ku ew ê meyandina uranyûmê kêm neke, lê belê wekî nîşanek hêzê yê wê bidomîne.**

Hevdîtinên ku di 26ê Tebaxê de li Cenevreyê di navbera Îran û welatên Ewropî de hatin lidarxistin bê rêkeftin bi dawî bûn, û civîna bilind a bi Rûsya û Çînê re li Şanghayê jî ji rejîma Îranê re ti parastinek berbiçav li dijî cezayan peyda nekiriye.

Wêneya yasayî zelal e: heke Îran pabendî peymanê nebe, her yek ji welatên îmzeker ên orîjînal dikare daxwaz bike ku ceza ji nû ve werin sepandin.

Mekanîzm wisa hatiye danîn ku ew nikaribe bi vetoyê di Konseya Ewlekariyê de were asteng kirin, ku ew yek jî Îranê dixe rewşek pir dijwar de.

Tehranê wek caran kartên bihêz li destan de nîn in. Eger berê dikarî komên xwe yên proksî ên li Rojhilata Navîn bikar bîne da ku bêaramiyê çêbike, lê niha ew kom nemane yan zaf lawaz bûne.

Eger caran rejîmê gef dikirin ku yê kontrola Tengava Hurmuzê -rêya herî girîng a veguhastina petrolê ya cîhanê- bikar bîne, lê niha rejîm lawaz e û hêza wê ya caran nemaye ku bikare wî karî jî bike.

Eger rejîm cehd bike û hewl bide ku hinardekirina petrolê bi rêya torên qaçaxçîtiyê bidomîne, nemaze heke Rûsya û Çîn hilbijêrin ku piştgiriya xwe ya aborî û siyasî lê qut bikin.

Yanî bandora van amûran caran li destê rejîmê de hebûn, hêdî hêdî kêm bûye û ew nikarin encamên dûr û dirêj ên ji nû ve destpêkirina tevahî ya cezayên NY telafî bikin.

Krîz ji ber nerazîbûna li welat û alozîyên bi hegera derketina şerê dubare bi Îsraîlê re dikare girantir bibe.

Ger rewşek were pêş ku bibe pevçûnek leşkerî ya rasterast di navbera Îsraîl û Îranê de û li heman demê de xelk jî dîsa hember rejîmê serî rake, Îran dikare bi tevlîhevî û bêîstîqrariyek mezin re rû bi rû bimîne ku hebûna rejîmê bibe aliyê tunekirinê ve.

Ji ber vê yekê, 30 rojên pêşîya me, dikarin ji bo Tehranê diyarker bin: an rejîm dikare li hember zextê bisekine, an jî ev destpêka krîzek pir kûrtir e û yê bi nemana rejîmê davî were.



# Çalak kirina Mikanîzma Trîger li dijî Îranê: Encam û Derfet






N. Serbet Urmiye

### Pêşgotin

Mikanîzma Trîger, yek ji mercên sereke yên li hev hatinê li dor bernameya navikî ya Îranê tevî welatên rojava ya naskirî bi " JCPOA" wate "Bercam" di sala 2015'an de bû, ku rê dida welatên endam bi hegera binpêkirina girêbesta lihevhatinê ji aliyê Îranê ve, ceza û dorpêçên ku Konseya Ewlehiyê ya Neteweyên Yekbûyî bi ser rejîma Îranê de sepandibûn, ji nû bên destpêkirin.

Bi zêdebûna çalakiyên navokî yên Komara Îslamî û kêmbûna hevkariyê bi Ajansê navneteweyî ya wizeya Etomî re, welatên Ewropayî careke din gefa çalakkirina mikanîzma han dikin.

Ev kiryar dikare bandoreke xurt li ser pêkhate û sîstema aborî ya rejîma Îranê hebe û di heman demê de jî dikare derfetên dîrokî ji bo tevgera azadîxwaziyê li Îranê de bafirîne.

### Encamên siyasî û dîplomatîk

Zext û givaşa navneteweyî: bi Vegerandina cezayên Konseya Ewlehiyê bi fermî Îran dikeve rewşa dewletek serpêçkar de. Ev rewş rêyê li rejîma Îranê girê dide da ku nekare bi awayekî berfireh di biyavên cur bi cur yên navneteweyî de beşdar be û hevkarî kirina rejîmê li ser welatên cîhanê jî giran bikeve.

Sînordarkirina danûsitandinan: Heta niha gefa berfirehkirina çalakiyên mehandina yoranyûmê, weke alavê zextê li ser rejîma Îranê di danûstandinan de bû. Lê bi vegerandina cezayan, ev jî bêbandor dibe û Îran neçar dibe ku di rewşek pir lawaztir di danûsitandinan de derkeve.

Perçe perçe bûn di hindur de: Zêdebûna zextên derve dikare bandor li ser arîşeyên hindur yên rejîmê jî hebe û bibe heger ku rejîm di hindur de ji hev bilav be.
Di vir de taqimên piragmatîk ên ku xwaziyarê têkiliyan bi cîhanê re ne û aliyên tundajo û navendên ewlehiyê dê bikevin çeperên li dijî hev.

### Encamên aborî û civakî

Astengkirina hinardeya nift û gazê: zindîkirina cezayan dê derfet û kanalên firotina niftê bêtir sînordar bike. Heta heke bi welatê Çînê an jî bi rêyên din yên nefermî d jî were firotin, lê dîsan jî tevî metirsiyeke zêde ber bi rû dibe dahateke wisa jî bi dest rejîmê nakeve.

Astengkirina pere û aborî: di rêya cezayên nawneteweyî yên bankî de, destê Îranê ji bo gehîştin bi diravên bîhanî û pergala veguhastina pereyan dê were qut kirin.

Ev dê bibe sedema bê nirxbûna pereyê Îranê û jordeçûna asta enflasyona aborî û berfirehtirbûna hêla hejariyê di hundur de.

Serhildan û nerazîbûna civakî: Krîza aborî rasterast bandor li ser bijîva jiyana mirovan heye. Enflasyon a aborî, bêkarî û jordeçûna bihaya hewcehiyên jiyanê, zextê li çînên navend û jêrîn dike û rêya serhildan û nerazîbûne ber wan vedike ku weke derfet ji ber tevgera azadîxwaziyê tê hijmar kirin.

### Derfetên ji bo tevgera azadiyê

Lawazkirina makîneya tepeserkirinê: Kêmbûna dahatê û nemana diravên bîhanî, destê rejîmê di qada pirçek kirin û bihêzkirina dezgehên serkutkar weke Besîc û hêzên ewlehiyê, dixe bin kevir de.
Lewma hêdî hêdî hêza tepeserkirinê ya rejîmê ji dest derdikeve û bê bandor dibe.

Berfirehbûna valahiyan di navbera gel û rejîmê de: di demekê de ku piştî serhildanên salên borî de û nemaze serhildana "jin , jiyan, azadî"yê , bi eşkere valahî di navbera gel û rejîmê de berfirehtir bûne û rejîm ji aliyê gel ve ber bi rûyê qeyrana meşrûiyetê hatiyê, givaşên aborî valahiya han di navbera civak û hikûmetê de kûrtir dike. Di rewşeke wilo de, meşrûiyeta siyasî ya rejîmê ji holê radibe û qada seferberiya civakî berfirehtir dibe.

Xurtbûna hêzên dijberî rejîmê li di qadên cîhanî de: zext û givaşên navneteweyî li ser rejîmê, ji dijberan re derfetek baş e ku weke alternatîveke xwedî pêgeh û demokratîk piştevaniya siyasî ya welatên Rojavayî rakêşin aliyê xwe û peyvendiyên xwe yên dîplomatîk bihêztir bikin.

Yekîtî û hevalbendî di hundur de: yekîtî û hevalbendiya hêzên navxweyî yên azadîxwaz, hewcehiya sereke ye ku cîhana derve bikare pitir zextê li ser rejîmê bike.

Di vê rewşê de, derfeta hevgirtinê bo hevrikên navxweyî û bîhanî peyda dibe û divêt ku bi rêkxistina xwepêşandanan û afirandina alternatîveke siyasî, mihaf jê were wergirtin

### Bertekên rejîmê li dijî tevgerên azadîxwaz

Tepeserkirina tundtir: Dibe ku rejîm ji bo veşartina lawazbûna xwe di asta cîhanî de, asta tepeserkirina dengên nerazî tundtir bike û di warê ewlehiyê de kontiroleke micid bişopîne.
Ku ev dîsan li ser rejîme giran dikeve, him di ware aborî û him jî di warê siyasî û civakî de.

Xurtkirina dezgehên Piropagandayên rejîmê: rejîma Îranê her tim ji cezayan weke komployeke bîhanî li dijî rejîm û gelên Îranê mêze dike.
Ev piropaganda dikare beşek ji raya giştî li dijî opozîsyonê han bide û meşên nerazîbûna bo heyamekê kontirol bike.

Zext li ser gel: Di destpêkê de zexta aborî li ser civakê giran dibe. heke opozîsyon û hêzên sivîl çareseriyên micid û ron pêşkêş nekin, ev zext dibe ku bibe sedema bêhêvîbûn û heta nizimbûna asta beşdariya giştî di tevgerên nerazî û azadîxwaz de.

### Encam

zindîkirina mekanîzma Trîger derbeyek stratejîk e li ser rejîma Îranê ku zextên navneteweyî û krîza aborî li ser rejîme girantir dike.
Her çend vê rewşê giranî li ser civakê jî heye, lê ji bo tevgera azadîxwaziyê derfeteke dîrokî peyda dike ku rêya demokrasî û azadiyê bi xurtkirina rêxistin, hevgirtin û pêşkêşkirina alternatîveke siyasî ya xuya û giştgîr xweş bike.

# Rewşa Îranê piştî Şerê 12 Rojan û Hilweşîna girûpên bedel yên rejîma Îranê



N. Hesen Mukerem



Guherînkariyên bilez ên li Rojhilata Navîn di van salên dawî de careke din nîşan da ku hevsengiya hêzê li vê herêmê ne li ser sloganan, belku li ser hêza rastîn a leşkerî, aborî û siyasî ya welatan e.

Di vê navberê de, Komara Îslamî ya Îranê heta niha hewl daye ku stratejiya xwe ya herêmî li ser "Hêla Berxwedanê"(mêhvera moqavmetê) û piştgiriya ji bo komên bedel ên weke Hizbullah li Lubnanê, Hûsiyan li Yemenê û girûpên din ava bike.

Ev tora bedel astengiya sereke bû li pêşiya her givaşek rasterast li ser Tehranê û weke amûrek ji bo şerê asîmetrîk ê Îranê li dijî Amerîka û Îsraîlê çalakî dikir.

Lêbelê, şerê 12 rojî yê dawî yê di navbera Îran û Îsraîlê de hevkêşeyên demdirêj guherand. Di wî şerî de, Îsraîlê karîbû çend derbên stratejîk di heman demê de Îran û van girûpan bixe, ji tunekirina fermandarên payebilind ên Hizbullah û Hêzên Heşda Şeibî bigire heya jiholêrakirina kesayetên sereke yên di Spaha Pasdaran û hejmarek zanayên etomî yên rejîmê de di operasyonên hewayî yên rast de. Her wiha, kontrola tevahî ya esmanê Îranê ji hêla Hêza Hewayî ya Îsraîlê ve peyamek zelal şand, Serdestiya leşkerî ya tevav a Îsraîlê û lawaziya peykara Îranê bû.

Zêdetirî du dehsalan e ku Hizbullah baskê herî girîng û xûya ê Îranê li dijî Îsraîlê bû. Ji şerê 2006an bigire heta şerên belavbûyî yên li Sûriyeyê, Hizbullah bi bandor xeta pêşîn a Îranê li dijî Îsraîlê bû. Lêbelê, kuştin û ji holêrakirina çend fermandarên payebilind ên wê komê di êrîşên rast ên Îsraîlê de, Hizbullah di rewşa xwe ya herî lawaz a dîrokê de hişt.

Ev pêşketin ne tenê têkçûnek leşkerî bû, belkî di heman demê de derbeyek piskolojîk û siyasî jî li ser helwesta Hizbullahê li Lubnanê bû. Hizbullah êdî hêza astengkirinê ya berê nemaye, û civaka Lubnanê, ku ji derb û xisarên giran ên şerên bêdawî westiyaye, ji berdewamiya vê nêzîkatiyê bêbawer kiriye.

Herwisa li Yemenê, di salên borî de Hûsî di hevkêşeyên Kendavê de karta destê rêjîma Îranê bûn li dijî arامiya nawçê û berjewendiya welatên rojavayî. Bi alîkariya Husiyan, Îranê şiyana gefxwarina li ser Tengava Bab el-Mendeb û Erebistana Siûdî bi dest xistibû. Lê guhertina hevkêşeyê di şerê dawî de û êrîşên hewayî yên armancgirtina hêza êrîşkar a Hûsiyan bi giranî kêm kiriye.

Niha, Erebistana Siûdî û hevalbendên wê, ji nû ve avakirina dîwarê xwe yê parastinê însiyatîfê digirin ser xwe, û Îranê bi bandor yek ji amûrên xwe yên herî girîng ji bo givaşxistina li ser Riyazê winda kiriye. Niha yek ji encamên diyarker ên şerê 12 rojî kuştina hejmarek ji fermandarên payebilind ên Spaha Quds, û her weha kesayetiyên nêzîkî torên ewlehiyê yên Îranê li derveyî welêt û zanayên etomî bû.

Ev fermandar di plansazkirin û pêkanîna operasyonên armanckirî yên li dijî dijberên bi nav Komara Îslamî li Ewropa û deverên din de bûn. Jiholêrakirina van kesan ne tenê valahiyek mezin a ewlehiyê çêkiriye, belkî di heman demê de beşek girîng ji tora tevlihev a operasyonên derveyî welêt ên Îranê jî hilweşandiye. Bi rastî, Îranê bi giranî hêza xwe ya êrîşkar li ser qada navneteweyî winda kiriye û di pozîsyonek parastinê de asê maye.

Ji aliyek din ve ya herî girîng û ji sembolên herî girîng ên serdestiya Îsraîlê di vî şerî de kontrola wê ya tevahî ya esîmanê Îranê bû heta "Ebas Îraqçî" Wezîrê karê Derve yê Îranê bona danûstandinan pêka gotinan li rêya Turkiyê îzin li Îsraîlê vergirt heta ku balafira hilgirê wî li Tehranê derkeve.

Balafirên şer û dronên Îsraîlê bêyî çi astengiyekê dikarîbûn navendên fermandariyê û baregehên mûşekî yên Îranê bikin armanc. Ev ne tenê lawaziya teknolojiya parastinê ya Îranê eşkere kir, belkî di heman demê de peyamek jî şand ku her rûbirûbûneke leşkerî ya rasterast dê bibe sedema têkçûneke giran û bilez ji bo rêjîma Îranê.

**Niha piştî hilweşîna bikiryar a baskên bedel yên Îranê li Lubnan, Yemen û Iraqê, û her weha windabûna beşek ji peykera fermandariya Spaha Pasdaran, Îran niha bi krîzek cidî re rû bi rû ye. Rêjîm êdî ne xwedî hêzek cidî ye ku li dijî êrîşên Îsraîlê bisekine, ne jî şiyana wê heye ku "kûrahiya stratejîk" a xwe li welatên Erebî bikar bîne.**

Wan pêşketinan Îran xistiye rewşekê ku heta hevalbendên wê yên kevin jî li ser pêşeroja polîtîkayên herêmî yên Tehranê guman dikin.

**1.** Lawazbûna Hîlala Şîe: Hizr stratejîk a Îranê ya afirandina mêhwera bi bandor ji Tehranê heta Deryaya Sipî bi rastî jî bi dijwariyek cidî re rû bi rû maye.
**2.** Mezinbûna meylên neteweperest li Iraq û Lubnanê: Civakên wan welatan êdî amade nînin ku lêçûnên hebûna girûpa bedel a Îranê qebûl bikin.
**3.** Terîk û tenê mana zêde ya Têhranê li ser asta navneteweyî: Bi lawaziya operasyonên girûpên bedel re, Îranê di danûstandinên cîhanî de jî bandora xwe ji dest daye.
**4.** Metirsiya nêzîkatiyek parastinê - hilweşîna navxweyî: Dema ku aliyên derveyî yên givaşê li ser Îranê zêde bibin, rejîm dê bi îhtîmalek mezin givaşa navxweyî li ser civaka sivîl û opozîsyonê zêde bike da ku lawaziya derveyî qerebû bike.

Di dawiyê de şerê 12 Rojan ne tenê pevçûnek kurt di navbera Îran û Îsraîlê de bû, belkî ew xalek werçerx bû di hevsengiya hêzên herêmî de. Îran, ku her gav girûpên bedel yên xwe weke stûna sereke ya stratejiya xwe ya ewlehiyê hesab dikir, niha piraniya van stûnan ji dest dane. Di şert û mercên weha de, Komara Îslamî di pevçûnek rasterast bi Îsraîlê re ji her demê bêtir bêparastin, tenêtî û bêhêvî dimîne.

Bi wî awayî, dikare were gotin ku Komara Îslamî ketiye qonaxek krîzek piralî, hilweşîna girûpên bedel, bêbaweriya bi hevalbendên herêmî, windakirina fermandarên leşkerî yên sereke, û eşkerekirina lawaziyên bingehîn ên di Spaha Pasdaran a terorîst de. Ev hemû nîşan didin ku hevkêşeya Rojhilata Navîn piştî şerê 12 rojan li gorî berjewendiya Îranê nehatiye şekildan û pêşerojek dijwartir li benda Tehranê ye.

## Nerîna



**“Mistefa Hicirî”:**

**“Têkçûna Komara Îslamî ne tenê ji ber îdeolojiyê bûye, lê Komara Îslamî ya Îranê di hemû warên leşkerî, îtla`atî, ewlehî û rêveberiyê de bi temamî hilweşiyaye. Ya herî girîng jî, gel piştgiriya wê nake”**



**“Mistefa Mewlûdî”:**

**“Komara Îslamî gelek kartên xwe winda kiriye.”**



**“Volodymyr Zelenskyy ”:**

**“Putin dikare were Kîevê. Dema welatê min her roj di bin êrişên mûşekan de be ez nikarim biçim Moskowê”**



**“Mistefa Ozçelîk” : Serokê Giştî yê (PWK)**

**“Em di ‘’pêvajoyeke nû” de derbas dibin ku her alîyek li gorî berjewendî û fikrên xwe navekî lê dikin.”**

# Kolonyalîzma Îranî li Gîlanê: Tepisandina zimanê Gîlekî û hewldan ji bo jinavbirina Nasnameyê



**N. Eskender Ceiferî**



Gîlan, welatê kesk ê Gîlekiyan, ne tenê erdnîgariyek bedew û xwediya daristan û deryayê ye. Ev herêm bi sedan salan mala gelê xwedî nasname, çand û zimanê taybetî ye.

Gelê ku bi navê “Gîlek” tê naskirin û zimanê dayikê yê wî “Gîlekî” ye. Lêbelê di sed salên dawî de, ev nasnameya resen gelek caran armanca polîtîkayên jinavbirinê yên desthilatên navendî û kolonyalîzma Îranê bûye.

Carna wisa dixuyê ku xelkê wir li zimanê xwe xwedî dernakeve, lê ev bi rastî beşek ji projeyeke organîzekirî ya kolonyalîzma Îranî ye.

Ew jî lawazkirina zimanê Gîlekî, sivikkirina çanda xwecihî, û guhertina pêkhateya dêmografîk ji bo jinavbirina çand û zimanê gelê Gîlek di projeya netewperestiya Îranî-Farsî de ye.

Her du rêjîmên kolonyalîst ên berê, hem Pehlewî û hem jî Komara Îslamî, di pratîkê de polîtîkayek hevpar li hemberî zimanê Gîlekî hene. Di sîstma perwerdeyê de, cîhê perwerdeya Gîlekî tune ye.

Di mêdyayên fermî de, ev ziman an tê sansorkirin an jî tenê bi awayekî karîkaturî û şermezarkirî tê nîşandan. Peyama dagirkar eşkere ye. Dixwaze bêje Gîlekî “ lehceyek paşmayî” ye û take zimanê hêja ji bo jiyana modêrn li wir “Farsî” ye.

Ev polîtîka bûne sedem ku gelek malbat bi zorê an jî ji tirsa sivikatiyê, zarokên xwe ji axaftina bi zimanê dayikê bê par dikin. Encama vê pêvajoyê, nifşek e ku têkiliya wî bi ziman û wêjeya Gîlekî re roj bi roj lawaztir dibe.

Ev, pêvajoya klasîk a asîmîlasyonê ye ku kolonyalîstan li tevahiya cîhanê pêk anîne. Ew jî jinavbirina ziman û nehêlana bîranîna civakî ye.

Lêbelê polîtîkayên kolonyalîzma Îranî ne tenê sînordarî ziman in. Yek ji pêvajoyên xembarker li Gîlanê, guhertina dêmografîk û koçberiya komî ye.

Di deh salên dawî de, hezaran kes ji koçberên Fars ber bi Gîlanê ve hatine koçberkirin an jî zeviyên berhemdar û erzan ên vê herêmê kirîne.

Ev polîtîka bi rastî tevn û pêkhateya dêmografîk a Gîlek diguherîne û Gîlanê dike “hewşa paşde ya Tehranê”. Heman cîhê ku ji bo avakirina vîlayan, berfirehkirina jiyana bajaran, û dûrxistina Gîlekiyan ji welatê wan e.

**Ji bo desthilata navendî, Gîlan dergehê jêopolîtîk, çavkaniya aborî û hêla parastinê ya stratêjîk e. Ji ber vê yekê her du rêjîmên berê û îro bi hemû hêza xwe hewl dane vê herêmê asîmîle bikin. Ji bo vê mebestê, aboriya vê herêmê danîne xizmeta Tehran û navendê, û tevgerên serxwebûnxwaz an jî çandî tepisandine.**

Zeviyên çandiniyê yên Gîlekiyan ber bi jinavçûnê ve diçin, û di encamê de serxwebûna aborî ya gelê Gîlek jî winda dibe. Ev pêvajo, mîna herêmên din ên di bin kolonyalîzma Îranî de, amûrek ji bo şikandina berxwedana civakî û çandî ye.

Li hemberî van polîtîkayan, tevgerên cuda yên nasnamexwaz û serxwebûnxwaz li Gîlanê ava bûne. Ji tevgerên çandî yên ku giraniyê didin ser perwerdeya zimanê Gîlekî û parastina wêje û stranên herêmê, heya tevgerên siyasî yên ku xweserî an jî serxwebûna Gîlanê dixwazin.

Dîroka Gîlanê, bixwe berxwedaneke mezin dîtiye. Serhildana Daristanê ya bi serokatiya Mîrza Kuçik Xan, yek ji mezintirîn tevgerên dijî-kolonyalîst ên sedsala bîstan li vê herêmê ava bû.

Tevî ku ew tevger bi têkçûnê bi dawî bû, lê hîn jî di bîra civaka Gîlakiyan de wek nîşana serxwebûnxwazî û têkoşîna li dijî dagirkariyê tê dîtin. Îro jî, gelek çalakvanên Gîlek mîrata Mîrza wek domandina riya xwe dibînin.

Heke em kolonyalîzmê tenê wek dagirkariya welatekî biyanî li ser welatekî din bibînin, dibe ku peyva “kolonyalîzm” ji bo Gîlanê guncaw nebe.

Lêbelê ezmûna Gîlanê nîşan dide ku kolonyalîzm dikare “navxweyî” jî be. Bi vê wateyê ku desthilata navendî bi karanîna amûrên çandî, aborî û dêmografîk, vî gelî ji nasnameya xwe biyanî dike û welatê wan dixe xizmeta projeyên mezin ên neteweyeke din.

Ji vê nêrînê, Gîlek ne tenê bi cudakariya çandî, lêbelê bi kolonyalîzma navxweyî re berbirû ne. Ev heman ezmûn e ku gelek neteweyên din ên di bin zordariyê de li cîhanê vê nas dikin.

Riya derbasbûnê dijwar e lê ron û xuya ye. Pêdiviya tevgerên nasnamexwaz ên Gîlekî bi organîzekirina zêdetir, piştgiriya navnetewî, û girêdana wan bi tevgerên din ên dijî-kolonyalîst re li herêmê heye.

Zimanê Gîlekî divê dîsa vegere jiyana rojane, li xwendingehan bê hînkirin, û di mêdyayan de derkeve holê.
Û ya herî girîng ev e ku gelê Gîlek divê dîsa bibe xwediyê welat û çarenûsa xwe.
Îro Gîlan li ber du riyên dîrokî ye. An qebûlkirina berdewamiya pêvajoya asîmîlasyonê û windabûna nasnameya Gîlekî, an jî berxwedan û vegerandina mafên çandî û siyasî.

Ezmûna cîhanî nîşan dide ku tu ziman û tu neteweyek, heya dema ku gelê wê dixwaze bigihe hebûn û azadiyê, jinav naçe. Wekî ku Dr. Ebdulrehman Qasimlo digot: “Neteweyek ku li pey azadiyê ye, divê nirxê wê bide.”

# Sûriye, di navbera Federalîzmê û Modela Yugoslavya de



N. Ebdulezîz Qasim



Piştî derbasbûna deh mehan li ser desthilata Ehmed El-Şera'h, diyar dibe ku ev desthilat Sûriyê ber bi çarenivîsek nediyar dibe, nemaze ku komkujiyên li dijî Elewî û Durzî bûne hereşeyek rasteqîn li ser yekîtiya Sûriyê û zengilê metirsiya dubarekirina diktatoriyek dîtir lêda.

Komkujiyên mezhebî her ji meha Adarê ve û heta niha bi awayekî berdewam li deverê Elewiyan têne pêkanîn, zêdebarî êrîşkirina li ser Dêrên Xiristiyan û komkujiyên hovane li dijî Durzîyan li Siwêda û Şamê Van komkujiyan tirseke zêde ji çarenûsek wisa li rex hemû pêkhateyên din û herwiha li rex Gelê kurd jî zêde kir, tevî rêkeftina 10'ê Adarê di navbera HSD û desthilata Sûriyê de.

Ku pêdagiriya desthilata nû li ser bersivdana daxwazên xelkê Sûriyê bi darê tivingê û redkirina çareserkirina maf û daxwazên neteweyî û çandî yên pêkhatiyên Sûriyê bi rêka diyalogê û aştiyê û avakirina pergalek demokratîk ya federal û nenavendî, tirsa duberakirina komkujiyên mezin zêde kiriye.

kiryarên desthilata nû bixwe dibin hereşe li ser yekîtiya Sûriyê, nemaze ku wê ti pênaseyek bo rêvebirina dewletê nîne û avakirina dewletê li ser binemayê demokrasiyê û nenavendiyê red dike.

Ev hemû wê yekê piştrast dike, ku desthilata Demkî ya Sûriyê, ku ji pizdanê rêxistina (HTŞ) ya di nav lîsta terorê de, derketiye holê, heta niha nikariye bibe alternatîfek ji rejîma berê ya diktatorî, û niyazek rasteqîn nîne bo sîstemeka alternatîv, û avakirina sîstemekî demokrat û federal, ku rêzê li maf û daxwazên pêkhatiyên cuda bigire, û biryardan û serweriya xwe ya nîştimanî garantî bike, zêdebarî ku desthilat El-Şera'h nûneratiya Kurd û Elewî û Durîzyan nake, û ev yek rewatiya wê qels dike.

Tevî ku yekbûna xelkê Sûriyê ne tenê bi beşdariya wan di hikûmetê de tekez dibe, belku bi rêya nêrîneka berfireh li ser bingehê danpêdan bi mafên hemû pêkhateyên Sûriyê, bi rêka bijartina diyalogê, ne jiholêrakirinê; bi rêka serxwebûnê ne bindestiyê; û rêvebirina saziyî, ne ji hêla partîzanî yan xêlekî "aşîretî" ve.


**Ev rewşa niha ya Sûriyê, ezmûnên welatên din tîne bîra mirov ku hikûmetên nikarin bibin alternatîf têk diçin ji ber ku nikarîne ji çarçova rehendên nijadperistî û mezhebî derkevin û paşî ketine di nav dav û rikehên destên derekî de.**

Nemaze ku desthilat El-Şera'h biryara xwe jidest daye, ji hêla Tirkiyê ve jê hatiye standin, û "Tirkiyê" li gorî berjewendiyê xwe di qada Sûriyê de dixebite, di heman demê de hindek belge ji hêla "routers" ve, grûpên çekdar yên alîgirên Tirkiyê wekî 'Emşat û Himzat bi kuştina nêzîkî 1,479 sivîlên Elewî tawanbar dike, lê ya herî xerabtir jî, dewleta Tirkiyê bi aşkereyî dijminatiya gelê Kurd dike, û deverên Kurdistana Sûriyê dagir dike.
Li hember destwerdan û dagîrkeriya Tirkiyê di Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê de, zehmete ku mirov li ser serweriya Sûriyê yan projeyek nîştimanî serbixwe biaxive!

Bi taybetî ku destwerdanên Tirkiyê bi astengiyan li pêş diyalogeke nîştimanî peyda dike û rê digire li pêş destxistina hêvî û armancên Sûriyan, nakokiyan gur dike, hevdem ku pirrengiya neteweyî û mezhebî li Sûriyê nabe sedema qeyean û nakokiyan, lê belê destwerdana Tirkiyê sedemê serekî yê zêdekirina qeyran û nakokiyan e û çaresernekirina rewşa siyasî û derengxistina her çareseriyeke siyasî.

Lewra tê pêşbînîkirin ku Sûriya tûşî senaryoyek parçebûnê bibe mîna hilweşîna Yugoslavyayê di sala 1992an de, ku helbet destwerdana Tirkiyê bi awayekî aşkere Sûriyê ber bi parçebûnê ve dibe, her çend ku hilweşîna fermî ya Sûriyê hêjî çênebûye jî, lê "parçekirineke nefermî" ya Sûriyê tê dîtin, ku niha hindek dîmenên modela Yugoslavya xuya dikin, her çend şert û mercên siyasî û leşkerî yên li Sûriye û Yugoslavyê cuda bin jî, lê hindek dîmenên hilweşîna dewletên pir-etnîkî û nakokiyên mezhebî bi zelalî xuya dikin, nemaze ku hikûmeta nû ya Sûriyê ne amadeye ku beşdarî çareseriyek siyasî bibe û xwe ji alozî û parçebûnê rizgar bike, berevajî vê, ew Sûriyê ber bi nakokiyên etnîkî û mezhebî dibe, û gefan li Kurd, Elewî, Durzî û Xiristiyanan dixwe, tirsê di dilê wan de zêde dike, û Sûriya dibin sîbera komkujiyên mezhebî û etnîkî yên berdewam, bêparkirin û koçberiyê de, bi awayekî rasterast Sûriyayê gav bi gav ber bi çarenûsek mîna ya Yugoslavyê ve dibe.

Lêbelê, heger desthilata Şamê bi awayekî hestyar û têgihiştî serederiyê bike û bo çareserkirina nakokiyan bixebite, hingî dibe ku li şûna modela Yugoslavyê modelek federal were bidestxistin.



# Çarenivîsa Hemî Dîktatoran Hilweşîn e





N. Xelîl Mîlanî

Her çend rêya hilweşînê dikare cûda bibe jî, dîrok nîşan dide ku dîktatorî bi xwezayî nearam in û di dawiyê de hildiweşin. Çarenivîsa hevpar a hemû dîktatoriyan hilweşîna wan e, ku ji ber tevlîheviyek ji zextên navxweyî û derveyî çêdibe:

• **Lawazî û Daketinên Navxweyî:**
**Nearamiya Xwezayî:** Dîktatorî mekanîzmayên rewa ji bo çareserkirina nakokiyan tunînin, ku wan bi xwezayî meyldarê têkoşînên desthilatdariyê yên navxweyî, darbeyan û veqetandina elîtan dike.
Rêvebiriya Xerab a Aborî: Bêyî hesabdayînê û bi desthilatdariyê di destên çend kesan de kombûyî, dîktatorî pir caran dibin sedema gendelî, kronîzm û sekinandina aborî. Ev piştgiriya giştî kêm dike û nerazîbûnek berfireh diafirîne.
**Krîzên Pîrbûn û cîgiriyê:** Gelek dîktator ji bo demên dirêj hukum dikin, û mirina wan a dawî an nekarîna wan pir caran krîzek cîgiriyê ya giran çêdike, ji ber ku pêvajoyek zelal ji bo veguheztinek nerm tune. Ev dikare bibe sedema valahiyek hêzê û pevçûnek navxweyî.
**Serhildanên gel û seferberiya girseyî:** Her çend dîktatorî tepeserkirinê bikar tînin jî, xwepêşandanên gelêrî yên domdar dikarin di dawiyê de kapasîteya rejîmê ya kontrolkirinê bişkînin. Hêrs, ku ji ber tepeserkirinê tê xurt kirin, dikare welatiyên asayî seferber bike da ku rîskên awarte bigirin, ku bibe sedema şoreş an nerazîbûna medenî a berfireh ku rejîm êdî nikare kontrol bike.

• **Faktorên derveyî:**
**Zextên navneteweyî:** Ceza, baykota dîplomatîk û şermezarkirina navneteweyî dikarin rejîma dîktatorek bi sînordarkirina çavkanî û rewatiyê qels bikin.
**Destwerdana biyanî:** Di hin rewşan de, destwerdana leşkerî ya biyanî an piştgiriya ji bo tevgerên muxalefetê dikare rasterast bibe sedema hilweşîna dîktator.
**Guhertinên jeopolîtîk:** Guhertinên di dîmena siyasî ya cîhanî de an hilweşîna rejîmên hevalbend dikarin dîktatoran tenê û bêparastin bihêlin.

• **Paradoksa tepeserkirinê:**
Wekî ku hate gotin, tepeserkirin dikare bi nezanî nerazîbûnê xurt bike. Her ku dîktator bêtir bêrehm dibin, ew pir caran bêtir ji gelê xwe û heta hêmanên di nav hêzên ewlehiyê yên xwe de ji xwe dûr dixin, û di demek dirêj de desthilatdariya wan bêîstîqrar dike.
Di bingeh de, dîktatorî li ser tirs û zorê têne avakirin, ne li ser razîbûn û desthilatdariya rewa. Ev lawaziya xwerû, digel kombûna neçar a nerazîbûnê, zehmetiyên aborî û potansiyela zextên navxweyî û derveyî, di dawiyê de dibe sedema hilweşîna wan.
Her çend dem û şert û mercên taybetî diguherin jî, tomarên dîrokî bi berdewamî nîşan didin ku tu desthilatdariya dîktatorî her û her namîne.
Rejîma dîktatorî ya Îslamî ya Îranê hemî nîşanên hilweşînê hene, ji xwepêşandanên navxweyî û nerazîbûna gel bigire heya zext û cezayên navneteweyî û karesata aborî ya berbelav bigire heya êrîşa derveyî.
Ji dîrokê dersan distînin, rejîmek wisa dê di demek kurt de were hilweşandin ger ew bi tevahî teslîmî daxwaziyên navxweyî û Rojava (Amerîka, Îsraîl û Ewropa) nebe.
Ev di demekê de ye ku rejîma Xameneyî bi salan e li ser sloganên wekî hilweşandin û tunekirina Îsraîlê ji nexşeya cîhanê, mirin ji bo Amerîkayê û hinardekirina şoreşa Îslamî ya Şîe û terorîzmê ji bo cîhanê ava bûye.
Lê piştî êrîşa rasterast a Îsraîl û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê li ser hedefên navokî û jiholêrakirina fermandarên Sipaha Pasdarên, helwesta dîktator Xameneyî şikest, û piştî salan ji hereşe , Xameneyî neçar ma ku di êrîşa 12 rojî ya Îsraîlê ya li ser rejîmê de bireve penageheke bin erdê, û 22 roj piştî bidawîbûna şer, ew di nav alîgirên xwe de bi Fedî û bi rûyekî şikestî xuya bû.
Lê ez bawer dikim ku rejîmek dîktatorî û teokratîk wekî Komara Îslamî nayê reformkirin, û Xameneyî bawer dike ku ew ê bi reformên herî piçûk zûtir hilweşe.
Gel û neteweyên bindest ên Îranê ti hêviyek ji reformkirina rejîmê re tune ne, bi salane ku Gelên Îranê bi dirûşmên reformîst û fundamentalîstannayên xapandin. Em bawer dikin ku ger rejîm teslîm bibe, Xameneyî dê bi çarenivîsek mîna Qezafî re rû bi rû bimîne, û di bûyera xwepêşandanên navxweyî yên berfireh li Îranê û piştgiriya Rojavayî de, rejîma Komara Îslamî dê were hilweşandin.
Piştî ku Îsraîlê êrîşî hedefên leşkerî yên Îranê kir û fermandarên Sipaha Pasdarên terrorist a rejimê , ku stûna sereke ya dezgeha parastin û tepeserkirina rejîmê ne, ji holê rakirin, ew bi tevahî lawaz kir û rûreşiya van û lawaziya hêzên rejîmê ji bo xelkê Îranê eşkere bû.
Ji bo xelkê Îranê eşkere bûye ku hêzên tepeserker ên Komara Îslamî Şêrên kaxezî ne û tenê dikarin li dijî gel û neteweyên bêparastin ên erdnîgariya Îranê manovra bikin. Ger gelên Iranê ji bo yekkirina gel, seferberkirina gel û pêkanîna tevgereke şoreşgerî ya seranserî welêt were organîzekirin, dezgeha tepeserkirinê ya rejîmê êdî nikare bi wan re rûbirû bibe.
Gelê Kurd li Kurdistanê bi salan e li benda fersendeke dîrokî ya wiha ye. Divê Opozisiyonên Kurd li Îranê yekgirtî û bo qonaxa hilweşîandina rejîmê û qonaxa pişt vê jî amade be û nehêle ku karesata ku di şoreşa 1957an de bi serê Kurdistanê de hat dubare bibe û nehêle ku ew bi tu hincetî careke din êrîşî Kurdistanê bikin.
Partiyên Kurdistana Îranê divê bi hemû hêza xwe mafên xwe yên neteweyî û demokratîk biparêzin û di vê salê de bi lez û bez hevpeymaniyek û tifaqek xurt bi netewe û kêmneteweyên din ên bindest ên Îranê, weke Belûç, Azerî, Ereb, û Tirkemen û hwd. re ava bikin.
Rewş, hişyariya netewe û gelên Îranê li gorî şoreşa 1957an pir guheriye, lê dîsa jî divê mirov amade û hişyar be da ku nekeve nav xefika Îraniyan û rê nede dîsan dîktatorî, faşîzm û kombûa desthilatê li Tehranê ava bibe.
Ev derfeta dîrokî divê ji bo azadiya Kurdistanê neyê windakirin, û divê partîyên Kurdistanê bi yekîtî, bername û stratejî ji bo her senaryo û guhertinan amade bin. Bi kêfxweşiyê ve, Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê di wî warî de xwedî bername û stratejiya herî hevgirtî û dîrokî ye.
Bi ji nû ve Çalakkirin a navenda hevkariyê ya partîyên Kurdistana Îranê û organîzekirina hêzek yekane ya Pêşmergeyan di pêşerojê de, ew ê di asta Kurdistan û Îranê de destkeftiyên baş bi dest bixin.

# Takperestî ji dîtina min ve





N. Vênû Fayq
W. Sîbel Xûbayî

**"Hemû cîhan here ciheneme , Ez dibe kûpa xwe a çayê vexwem ". Fiyodor Dostovîskî.**

Ez bawer nakim li civakeke rojhilatî de wisa bi hêsanî bikarin têgeha taksperetî bê zeq kirin û banghêjî bo bê kirin, Bi taybet ev civatgehên heya niha pirensîp û disiplînên radîkalî di nav de serîhildane, yan ewên ku ol dest xistine nav piraniya têgehên jiyana takên civakê.

Dijware di nav sîstemeke civatî wisa daxistî û netêgihiştî de nirxê bi takeke xwe bidî, û çavnihêr bî da ku rêz bo takdûr li hizirkirin û misogeriya bi kom û jiyan û destwerdana bikom li hûrgiliyên jiyana yên din de bi hinceta dab û nerît û ol de ezmûn bikî.

Çimkî takperestî di nav rewşa lîbrralî û radîkalitiyê de dimeşe ku armanc nûkarî be û li tev aliyan de li ber berjeweniya tak.

Eger weke ku di pênaseyekê de hatiye ku helwesta exlaqî û felsefeyeke siyasî û îdolojî, yan perespektîveke civakî bi nirxê riha tak li takeperestî binêrin, eva dibe bibêjin ku em di nav sîstemekê de ne ku hilgirê exlaqeke cihê hitbarê nîne li ser bingeha felsefeyeke siyasî û îdolojî, ku heya niha tak li cihê bi wec bi xwe nehatiye danîn, û piştre civak bi liberçav girtina faktera ol û bac û adet hêj hişmendiyek çalak li hember têgehek takeperestî hebûna wî nîne.

**Takeperestî azadiya li axaftinê de jî ji takan distîne, berjewendiya deselata serveyî civakê ye ku dewlet û ol û ûrfên civakî ne , tak di vê hevkêşeyê de dikeve derveyî bazinê û zagonên wê û ti cure azadiyekê li xwe nagire.**

Bi vê cureyî hemû axaftinek li têgeha takperestiyê de vala dibe.

Hilgirê hizra ola tundajo tak kirine armanc li hemû aliyekê ve bi hinceta başî û xirap û padaşt û siza û dunya û cehnem, di demekê de ku takek timetirsiyek bo ser yên din nebe, dibe em baweriyê bi vê yekê bînin ku her kes azade ku rêya xwe çawa hilbijêre û bi heza xwe têde tevbigere û bi awayî ku hilbijartî biçe cehnem an bihûştê. Çimkî di dawiyê de eva takê feydemend an zirarmende her tak bixwe dibe, êdî tiştek bê wateye ku kesek din xwe bi vê mijûl bike ku kesên din çawa hizir dikin û çawa jiyana xwe derbas dikin, Her weke tiştek bê wate ye ku desthilatek hikumdar tak li derveyî hemû hevkêşeyan dabinê.

Di civaka lîbraliyan de tak di nav sîstemek hikumdar de dijî ku tev xizmetgizariyek bo hatibe desteberkirin, her tiştek ku pêwîst be, Pêwîst nake bo li xwe meztir yan desthilata olî yan civakî bizivre.

Bi awayeke sîstematîk pirsgirêkên xwe di nav torekê bihev girêdayî li zagon û xizmetgizarî li ser bingeha maf û erkan çareser dibin yan eger şaşiyekê jî bike eva tenê zagone ku desthilata cezadanê hebe, û di nav civakekê de mîna civaka me nefret jê nayêkirin, û di van civatgehan de tak dengê bihîstî ye û şiyana guherîna çaksaziyê heye.

Bi kurtî li wan cure civatgehan de tak li destê zagonê de ye, lê li civatgehên rojhilat de tak li destê zilamên olî, civatgeh û sîstemeke civatî hikumranî de ye ku bawerî bi takperestiyê heye û ti maf û azadiyeke tak nîne û dûr li çavê desthilat, ol û dewlet û dab û nerîtê çi tiştek çê nabe.



# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Zêdetir ji 10 girtiyên din ji aliyê rêjîmê ve hatine bidarvekirin



Pêka dawî amarên belavbûyî, li sibêdeha roja Şemî 15ê Xermananê, "Ferzad Muhibî" li girtîgeha rêjîmê li bajarê Qezwênê û herwisa li roja Pêncşemî 13ê Xermananê, "Îbrahîm Seferzay" li girtîgeha rêjîmê li bajarê Yezdê, hatine bidarvekirin.

Li roja Çarşemî 12ê Xermananê de jî "Ebulfezil Eskerî" û girtiyek din ê bi nasnavê "Derwîşpûr" li girtîgeha rêjîmê li bajarê Tewrêzê û "Mêhrdad Îrevanî û 3 girtî yên xelkê Efxanistanê yên bi navên "Rûhullah, Nizam Hekîmî û Ellahbexş Mîrcehanî" li girtîgeha rêjîmê li bajarê Qumê de hatine bidarvekirin.

Li vê rojê de "Hebîb Etayî, Riza Aqacanî" û girtîyekî xelkê Efxanistanê ku nasnameya wî nehatiye zanîn li girtîgeha Qizilhisar a rêjîmê li bajarê Kerecê û li 13ê Xermananê jî "Celal Muradî" li girtîgeha rêjîmê li bajarê Kirmaşanê, hatine bidarvekirin.

Herwisa rêjîmê "Mihemed Kaşifî û Eskender Bazmandigan" jî her wan rojan de li girtîgeha Adilabad a rêjîêmê li bajarê Şîrazê de bidar vekirine ku ji nû de eşkere bûye.

## Jîngehparêzekî din li Merîwanê Şehîd bû




Roja Înê 14ê Xermanan a 1404 a Rojî, ciwanekî jîngehparêz ê bi navê "Rêbîn Goranî" piştî 8 roj man li rewşa komayê, li nexweşxaneya "Tewhîd" a bajarê Sinê de şehîd bû.

"Rêbîn Goranî" yek ji wan ciwanên biwêr û jîngehparêzên gelê me bû ku xwebexşane û bi sehkirina berpirsayetiya civakî bo kontrolkirina agirên li daristanên "Hencîran"ê li Merîwanê, hate meydanê û li vê dozê de şehîd bû.

Şehîdbûna vî ciwanê jîngehparêz li demekê de ye ku bi tenê 40 roj ji şehîdbûna 3 şehîdên jîngehparêz ên bajarê Sinê "Şehîd Hemîd Muradî, Şehîd Çiyako Yûsifî û Şehîd Xebat Emînî" derbas dibe ku li hewla temirandina agir li çiyayê "Awiyer"ê de şehîd bûn.

Dubarebûna wan bûyerên tal, vê dide xuya ku çawa agirberdanên bizanebûn, bikêrnahtina berpirsên hikûmî û heta nebûna destpêkîtirîn alavên temirandina agir, ciwanên niştiman yek bi yek, li pey hev dike qurbanî.

## 2 saziyên navnetewî yên mafê mirovî li derheq karesata mirovî li Îranê huşdarî dan




Saziya Libihorîna Navnetewî û herwisa Saziya Çavdêriya mafê mirovî, li roja Çarşemî 12ê Xermananê, bi belavkirina daxuyaniyeke hevpar huşdarî dan ku rêjîma Îslamiya Îranê piştî şerê 12 roje pêleke nû ya tepeserkirinê li Îranê de dest pê kiriye.

Li vê raporê de hatiye ku rêjîma Îranê bi hêceta ewlehiya netewî, dest avêtiye kiryarên wiha berfireh û dijwar ku reştirîn û metirsîdartirîn serdema Îranê ye.

Pêka vê raporê zêdetir ji 21 hezar kes ji dijberên siyasî ve heta parêzerên mafê mirovî û rojnamevanan ve heta bikarhênerên torên civakî, malbatên şehîdan û heta xelkê welatên biyanî, ji 23ê Cozerdanê ve heta niha ji aliyê rêjîmê ve hatine girtin û herwisa Kurd û Belûç û kêmîneyên olî yên wek Cihû, Kirîstiyan û Bihayiyan bi awayekî cuda û taybetîtir bûne armanca wan tepeserkirinan.

Wan 2 saziyên mafê mirovî tevî nişandana nigeraniya xwe ya kûr li derheq karesata mafê mirovî li Îranê, huşdarî dane.

# Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (501)





## Parek ji wêneyên merasima bihilkrfta weşana 500 mîn hejmara Rojnameya AGIRÎ





